"TKP'nin Sesi"

Pazar, 1 Şubat 81

Bu yayınımızda şunları dinliyiceksiniz:

1. TKP MK Genel Sekreteri Bilen yoldaşın 15'lerin öldürülmelerinin 60. yılı nedeniyle konuşması (tekrar, 28.1.1981.)

2. Kürtçe yayın: Bilen yoldaşın 28.1.1981 günü radyodan yaptığı konuşma üzerine /Şerf.)

Spiker: Şrf.

---

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

1-2-1981

TKP'nin Sesi

Kürtçe yayın.

BİLEN YOLDAŞIN 28-1-1981 GÜNÜ RADYODAN YAPTIĞI KONUŞMA

Guhdarên hêja, hevrê İ.Bilen'ê sekreterê Giştî ya NK PKT li 28'è berfbarînapaşîn li Radyoya D.PKT yê da axaftinek pêkanî.Vêga em axaftına Hevrê Bilen bi zimanê Kurdî kurtî pêşkeşê we dikin:

Hevrê Bilen aha destpêdike axaftina xwe..

HEVRÈNO...

Çîna karkerê Tirkîya di dîroka xwe da cara pêşîn di pîvê welat da rojek deqa demek pir nû bi şadî ji vî 5 hîv berê pîrozkir.Ev salewaxta damezirîna 60 salê partê me, PKT' yê bû.Vêga em 5 hîv davîya wî rojê, bin dîktatora leşkerî salewaxta 60'emînê kuştinên Mistefa Suphîyan bîrtînin.

Ev herdu roj dawîya 60 salê, alê hemû komelên partême hundurê

şerên hemberê emperyalîzmê û paşwerûtîyâ-hundurê welat tête pergînandin. Ev jî rastîya hane giring eşkeredike:Burcûwazîya paşwerû ra kadroyên damezirandîverên partê me weka zîya qirkirye.Lê belê negîhîştye armancê xwe.PKT dijî,şerdike.Di bin gerînên diktatora leşkerî jî qirkirina PKT yê bibeyî nîne.Lewra bê hevce proletarya tew were qirkirin.Partê Mistefa Suphîyan, bi çekên Maksîzmê-Lenînîzmê va, di hundurê proletaryayê da za.Salên derbasbûyîda alên Sedhezeran karker û kedkiran ku ev tevê meşînan bubûn, halana" Panzdehan da destpêkirin,Sedhezeran didine jîyîn' em bînine bîra xwe..."

Dawîyê Hevrê Bîlen şera rizgarîya netewî, giringîya şoreşa oktobirê, yekbûyîna gelên Tirkîya'yê,dijîtîyên hundurê burcûwazîyên welatê me eşkere dike û^ aha dibêje:

"HEVRÊNO Buyerên 28-29'ê perfbarînapaşîna bixwîn hînêmekir,

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

burcûwazî ji bo sazûmana mijokîyê ser lingan bigre, hemberê Partême, hemberê çîna meyê karker, xilmetkirina çek û zordestîyê wê bibîhîse. Wan rojanda qirbûyîna kadroyên rêbirên partême, di hundurê qorên tewgerên Komunîst Tirkîyaî da, gerînên poçikgirîyên-burcûwazî û Likîdatorîyê da afirandin.Part bi şerên dirêj likîdatoran ji qorên xwe jibart.Ber vî PKT, hemberê hemû indakirinên xwe yên şewat, şoreşkerîya hundurê şera rizgarîyê netewî, û xwerbûyînên pêşwerûyê ku hundurê burçwazîya netewîdaye dît.Hê wî demê hemberê dîtinên şaş derket.

Partême neyara pêşîn,emperyalîzm û hevkarên wî ji ber çewan dûr nexist.Hemû hêzên netewî hemberê emperyalîstên êrîşkar,gazîkir hundurê enîyekda yekbibin."

dawîyê hevrê Bîlen axaftina xwe aha didomîne:

"Bêşik li cîhanê ji wî rojê heyya îro tebaba hêzan,welatême da ge-

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

rînên polîtîk, ekonomîk, û civakî binva guhurîye.Ji girêbûyîna emperyalîzmê, ji bin lepên yekdestan,ji buxranên kûr,gelême wê bi şoreşa demokratîk pêşwa ku vedibe sosyalîzmê'va rizgarbibe.Heyya girêbûyîna emperyalîzmê neyê dawîkirin, ji NATO'yê neyê derketin,peymanên-cotî neyî çirandin,wergehên-leşkerîya emperyalîstan ji erdême neyê awêtin, karbidestîya yekdestan neyê dawîkirin,reforma axê demokratîk neyê çêkirin,hemû heqên demokratîk,civakî ên çîna karker û kedkiran neyê peydakirin,pirsiyara Kurd li ser bingeha otonoma-hêramî neyê hurindarkirin: pirsîyarên giran ku Tirkîya hemberê vane hevc nîne werine hurindarkirin."

Hevrê Bilen axaftina xwe da êrîşkarîya emperyalîzmê û planên wana, polîtîka cuntayê ya der welat û ekonomîk eşkeredike.Nîşandike cunta faşîstan hilnade hemberê xwe.Demogojî û derewên cuntayâ kifşdike û axaftina xwe aha didomîne:

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV

HEVRÊNO

ji van hemû kifşkirinan akama han derdikeve:Polîtîka cuntayê alê bergehê bingeh babetîyek alîkarê emperyalîzmê û yekdestan didome.Lê çiheye hinek pêkanînên wî timmî mafên birên emperyalîzmê herî erîşkar û herî paşwerûyê burcûwazîyên yekdest eşkere nake.Ji wê semedê, dorhêlên han hundurê ordî û cuntayêda bi navdarîyên uşteyên ~~ku~~ girêdayê xwe dixebitin rejîmê ber bergehîya armancên xwe bergehbikin,ewî hêjî bikşînine alê rast.

Dijîtîyên hundurê ordîyê, xwe hê roja han va nav polîtîkayê cuntayê da nîşandide.Lê çineye,dijîtîyên han,ji ber xwe alê çîna karker,alê gel û demokrasîyê akam nazê.Dijîtîyên hundurê çînên karbidest, ji bo şera çîna karker û şera gel dij-emperyalîst,demokratîk hevcên kêrwere dide zayîn.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Tentêla han da,watinîya partê koman û milyonan kedkiran honandin û kişandina kolanên şere.

Weşema Burcûwa,pindamênb hemberê terorîzmê hatye damezirandin,wejîbartên wanê derbasî ku xwe ser komanda nîşandike mezinnîşandide.Lê çiheye li bajeran,li gundan, cîbcî neşadî destpêkirye dizivire berxwedayînan.Karker ji bo heqen xwe yên ekonomîk civakî dora kardistan berxwedayînan pêktînin.Gundîyên Atalan meşîn sazkirin.Hinek bajeranda gelbi xwe faşîstan û rênckiran eşkere dike.Bi girtîyan û bi malbatên girtîyan ra kampanyayên alîkarîyê tête sazkirin.Cîvan li salewaxta qirkirina Kehremanmaraşê MHP'A faşîst û zordestîyên cuntayê protestokirin.Hemberê kampanyaya bi zorê jibo biçekbûyînê dirav berefkirinê berxwedayîn pêktê.

Hundur û li der ordîyê hinek welatparêzpîvên kêm-zêde, hinek pêkanînên cuntayê piştek dikin.Tentêla handa, hevce hêzên han em bikşînine şera demokrasîyê bitebat, û şirîktîya cîna karker.birên ordî

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

û cuntayê alîkarên herî paşwerû mîlîtarîst û faşîst û piştekê wanê polîtîk der ordîyêda hevce em bihêline sere xwe.

Livînên tofên serborîvan û terorîst weka pêşîya 12 Kewçerîne îrojî zirarên giran didine tekoşîna çîna karker. Polîtîka serborîvan carek din jî curek tehl îflaskir. Ji vî hevce em dersên kêrbê bistînin. Ev leze. Lewra ev tof ji bo çînên karbidest watinîyên xwe indakirine û mirovên cîvan ku girêdayê wan tofanin bi hovîtî têne qirkirin. Hemberê vî hemû hêzên demokrasîyê hevce bê deng neminin. Ji bo şoreşkerên cîvan, serast ku dehf bûne hundurê avzêma îroyîna bi bixwîn ji bo wana rizgarbikin komunîst vêhemû hevcên xwe pêkbînin.

Ji bo hêzên demokrasîyê herî fire yekbikin gava pêşîn yekîtîya hêzên çep damezirandin hevce. Ji qezencên berîya 12 kewçerînê destpêkirin, ji xeletîyên bihembenî hatîye pêkanîn ji wan dersên hevc derxistin dî-

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

veyahe.Hêzên çep PKT,TİP,TSİP,Tevgerê Demokratê Şoreşkerê Kurd yekîtîya hêz,şer,livînê bidamezirandina, alternatîfek demokratîk ku wergerandina leşkerî pindambike dikaribûn peydabikin.Daîyê pêvçûnên skolastîk,işk ku ser babetîya cuntayê tê domandin hevce em daynine alîyek.Ser bingehîya daxwezîyên kesdar yên koman ser platformek hevce em derbasê livînê bibin.

HEVRÊNO! Îro pirsîyarên zûturkê hêvîya hûrindarîyêdane, û gelême hemberê wan pirsîyarane eşkereye.Buxrana ekonomîk, polîtîkaya dorhêlên karbidest ku parêzdarê emperyalîzm û yekdestane welet dikîşîne hedîmînek netewî.Emperyalîzma Emerîkayê, dorhêlên karbidestê NATO'yê ji bo polîtîka xwe ye êrîşkar Tirkîya bikine navgînên zordestîyên xwe li ser Tirkîya'yê gûrdikin.Hemberê hemû hêzên demokrasîyê xeterîya mandox bûyîna dîktatora leşkerî û hêz qezençkirina parêzdarê faşîzmê rojekêdaye.

Pindamkirina çûyîna han,derbasbûyîna polîtîkayek bêblok,serxwebûn.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

ji bo bergehbûyîna demokrasîyê hundurê şerên rêya daxwezîyên kesdar da tevgerek gelê bihêz afirandin.Hêzên dij-emperyalîst, demokratîk enîyek da yekkirin:Evana pêşîya hêzên çep da vatinîyên rojekin.

Ancak bi tekoşîna gelê û hemû xxxx hêzên demokrasîparêzan rejîma cuntayê wê were dawîkirin.Dîveyahe PKT, hundurê şerên ji bo daxwezîyên rojek da kamonra nîşanbike û têbigihîne; bin gerînên hebûna cuntayê de demokrasî naye damezirandin, tu pirsîyarek gelê nayê hurindarkirin.

HEVRÊNO !Kadroyên partê di bin gerînên têkilhev û herî giranda dixebitin,şerdikin.Li zindanan,di bin teda û rêncê komunîst vekokên mêrxasîyê nîşandikin.Dibine vekok û piştekê hemû hêzên pêşwerûyên din.Komelên meyên Partê, dijwarîyên komelîyê ku wergerandina leşkerî anîbû, wana derbasdibin,xwe hînê gerînên nû dikin,berxwedayînên koman ku bilinddibe wana dihonînin,li berxwedayînanda qorên pêşîn da cî digrin.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

PKT tîk û tîk li ser lingane.Kadroyên me, komên kedkir pingê şerên xwe ku wana dinav cerîbandinên dijwarda qezençkiribûn indanekirin.Hê rastîyek heye: Bendên me yên komanra çiqas bihêzbe, komelên partê me hemberê êrîşan ew qasî wî pîvê baştir wê werineparêztin.Ussane Komunîst hê bi hêzek mezintir bendên xwe bi komanra bihêzbikin.Ger ewe kardistan her dem kelayê me bibe.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI